



Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Newroz



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Hejmar (101) sal 17 Sibat 2012 z - 2623 k Buha (15)ps P.S

Gotina ji Konferensa Helêrê ya kurdên Sûriyê re

Beşdarên birêz...

Silav û rêz...

Tête zanîn ku , di siha karbedestîya rijîma Be'is de , eve 49 salin ku gelê Sûriyê bi kurd û erebên xwe ve , ji Alfebeya demokrasiyê û mafên mirovan bêpar e . Bi ser de jî , di derbarey gelê kurd de , nijadperestî , şoventî û siyaseta fermî ya înkarkirina hebûna kurd her li dar e .

Newekhevî , tund û tûjî , çî bi dizî çî aşkere , di jiyana civaka Sûrî de , bi gelek şeweyan rû daye û dide , lewre jî gelê Sûriyê serûber bi êş û xeman hestedar e .

Di dema îro de , xemgîniya gelê kurd li Sûriyê , li beramber û di çarçewa tabloya Sûriyê de , ne tenê ji ber tund û tûjî û berdewamiya herikandina xwînê li hinde herêmên Sûriyê ye , lê belê , ji ber mijdarî , nakokî û nelihevkirina hêzên rikebiriya Sûriyê ye jî .

Rikebiriya Sûrî çendî di Medya erebî û ya cîhanî de tête binavkirin û rengdan , lê mixwabin ewqas jî di hundirê xwe de nexweşî , nakokî û nelihevî ye , ji ber ku , jiyana û pêvajoya hêzên siyasî di hundir civaka Sûrî , di siha desthilatdariya parta Be'is de , li dirêjahiya ewqas sal , têra xwe hatiye jihevixistin û pişaftin , lewre jî mafê kurda ye jî , ku di qonaxeke weha de , xwedî navnîşaneke siyasî , nûnertiyeke serbixwe **D.R.(11)**

Şoreşa gelê Sûriyê
Qeyran di
qeyranê de
Rozad Elî

3

Bîranîna xebatkar
M.E.Xoce

4

Dr. Xefil Ebdela

Panorama
rêresma
ya nemir Dr.
Şêzad H R

6

Nivîsandina bi zimanê
Kurdî pêdiviyeke
netewî ye
Mûsa Zaxurani

9

Email : Newroz 95 @ hotmail . com